

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT





zarok fêkiyên malan e

RASTO Û XWARO(3)

Gava mizgîn çû ji paşê re, paşa ferman kir ku herkes ji bo şahiyê serbert be, kî çi dixwaze bike, ji dest neyê girtin û alîkarî pê re bê kirin.

Dibêjin kêf û şahî li nav bajêr û li tevaya welêt belav bû. Bê jimar pez û dewar hatin serjêkirin, govend hatin gerandin, xwarin û vexwarin heta çil roj û çil şevan dom kir.

Rasto di van rojan de mêvanê herî dilovan bû (ezîz bû) û li kêleka paşê rûniştibû, Daxwaza wî bê şik pêk dihat. Piştî kêf û şahiyê, paşa ji Rasto pirsî:

-Xortê hêja! te dilê min yê pîr xweş kir. Ez heya mirinê ji bin vê qenciya ku te bi min kirî, dernakevim. Ez çi bêjim wê kêmbê, ez çi bidim te wê hindik be, ka tiştêkî bixwaze, ez amademe ku, ji te re hemû tiştî pêk bînim.

Rasto:

-Paşayê min! min qet malê dinê navê. Ez jiyaneke dirêj û bi kêfxweşî ji te re û kêfxweşî û serbilindî ji welat û gel re daxwaz dikim. Min karê ji karê mirovatiyê pêk anî ye.

Heger paşayê min ferman bike ez ji bo rêwîtiyê azad bibim, daxwazên min tev pêk tînim..

Dibêjin! Paşa gelek dan û standin kir, bi şewirdarên xwe şewirî. Bi qîza xwe û dayika wê re axivî. Piştî van bûyînan teva, Paşa dît ku, ji lêmarkirina qîza xwe pêve tiştên qenc ku, bi Rasto bike tune.

Dibêjin ev biryara han ji Rasto re jî gotin û Rasto qîma xwe pê anî, bû zavayê Paşê.

Ji Rasto re qesrek ava kirin, mal û zînet ji ji dest ne girtin. Lê Rasto, baweriya gel û dewletê tev bi xwe anî, bi kar û barên xwe yê durist. Ji Rasto gelek hate hezkirin. Ji ber ku kurên paşê tunebûn, bi çavên lawê paşê li Rasto dihate nerîn.



Paşa bi nav salan de çûbû, roj bi roj ji hêz diket û nema karî bû serokatiya welêt bike. Di saxiya xwe de Paşa ferman kir û got:

"Gava ez bimrim Rasto kare darê min bigre"

Piştî derbasbûna demekê, roja Paşê hat û ew çû ser heqiya xwe. Rasto li şûna Paşê rûnişt bi rast û ronî karên xwe meşand.

Gava Rasto dar girt destên xwe, hevalê xwe Xwaro ji bîr ne kir. Rasto nişaneke ku, hevalê xwe pê das dike û hevalê wî pê wî nas dike li dergên bajêr daliqand û dergevan pê serwest kirin ku "kî hat li van nişana nihêrt û keser kişand, wî bigrin û bînin dîwana paşê"

Çend roj, meh û sal derbas bûn ez nizanîm, lê dibêjin rojekê ji rojan dergevana bi stûkîra yekî girtin anîn dîwana Paşê û gotin:

-Vî kesê ha li nişana Paşayê me nihêrt û keser kişand, weke ku, Paşa ferman kiriye me jî ew girt û anî...

Cilên Xwaro zîval zîvalî bûbûn, rû û simbêlê wî hati bûn û di halekî gelek pejmûrde û perîşan de mabû. Lê Rasto dîsa ew nas kir, belê Xwaro, Rasto nas ne kir.

Paşê (Rasto) ferman kir:

-Zû wî bibin avgermê, pak û delal bişon, ez bawerim ku birçîye jî, xwarinê bidinê, kincên paqij û nû lêkin û paşê wî bînin vir.

Dibêjin piştî fermana Paşê pêk hat, Xwaro anîn ba Paşê. Lê Xwaro nema zane ku çi bûye, devê wî ji hev çûye û li derdora xwe bi tirs dinere. Di tevaya jiyana xwe de Xwaro guhdaneke bi vî awayî qet ne dîti bû.

Xwaro dane rûniştandin. Paşê jê pirsî:

-Brako! ma te ez nas kirim ?

Xwaro:

-Na ez benî,ma ez rebenê xwedê ji ku cenabê te nas dikim

Rasto:

-Ez im.Ez brakê te Rasto me.

Hate bîra Xwaro ku,kengî Rasto di bîrê de hişti bû û ji nû ve tirsîya û lerizî,Rabû ser xwe,xwe avêt dawa Paşê û bi hêvî û lava got:

-Ez ketim bextê te,min bi te kir tu bi min meke.Min nebaşî kir ez poşman im,li min bi-bore..

Rasto got:

-Xwaro! min destbirakitiya xwe ji bîr ne kiriye,ez ji te ne xeyidî me.Ji ber ku,em hevdû nas dikin,min baweriya xwe bi te aniye û ez te dîsa baş dinasim.

Xwaro dît ku,hate azad kirin,ji nû ve hişê wî hate serî,dîsa li dora xwe nerî.
Erêêê...naskir ku,hevalê wî,destbirakê wî Rasto bûye Paşa û ew jî bi zikê têr bi kin-cên nû li dîwanê rûniştiye.

Xwaro ji Rasto pirsî:

-Brayê min ê hêja,ez karim bipirsim tu bi çi awayî gihişte vir ?

Rasto:

-Belê.Ez gava di wê bîrê de bûm.....

Û Rasto serpêhatiya xwe bi dirêjî ji Xwaro re got heta ku Xwaro anîn dîwanê,Piştî gotina serpêhatiya xwe,Rasto ji Xwaro re got:

-Brakê min,ez te nema berdidim.Ezê qesrekê ji te re li vir ava bikim.Ez zanim! tu bi serê xwe li ku dibî bibe,tuyê tim di nava kêmasî û xerabiyê debî,lê em karin hevdû ragirin...

Xwaro dengê xwe ne kir,lê tim û tim dida ber çavên xwe ku,çawa hevalê wî ji bîrê derketiye û gihiştiye vê dewrana han.



Xwaro diket nava xewn û xeyalan da ku, rojekê biçe û ew jî têkeve wê birê belkî ew jî bigihije tişteki. Bi van xeyalan û bi hêviya dewlemend bûnê, Xwaro rojekê bê deng rabû bi rê ket. Berê xwe da wê birê û çû.

Pir çû ne çû Xwaro gihişt wê birê, kete hindurê wê û tê de ma.

Xwaro di birê de ma. Rojekê dîsa Gur û Sixur û Rovî hatin ser birê ji bo ku civîna xwe ya demî bikin. Lê belê hersê jî bê kêf bûn. Her siya dest bi pirsên xwe kirin.

Rovî:

-Hûn zanin! Hin kesan çûne ew mal û zêrên şikefta min tev birine. Ez nizanîm hinan li me guhdar kirin an we yekî ji devê xwe revandiye ku ev tişt bi serê min hat?

Gur:

-Bi xwedê hin kesan çûne ew zîhayê kaniya gund jî kuştine. Ez nema wêrim bi rexê kerîyan kevim. Şivan kûçikên xwe hayî min didin. Ez li zenga diranan mame, newqa min higiştiye hev.

Sixur:

-Hûn zanin ku, qîza paşê jî sax bûye? Ez bawerim hinekan li me guhdarî kiriye

Hersiyan bi hev re li hindurê birê nerîn. Dîtin ku, du çav di birê de diçûrisin. Bi hev re gotin:

-Waaaa! Vaye ê li me guhdarî kiriye, dîsa di birê de ye. De werin em ser wî bi kevir û beran dagrin.

Û dibêjin hersiyan çiqas kevir û beran wan dora hebûn tev anîn û avêtin birê. Ser devê birê qûç kirin û Xwaro di bin keviran de ma.

Rast bi rastiyê de, xwar bi xwariyê de çû. Çîroka min çû diyara, kêfxweşî û azadî ji bo xwendevan û guhdaran.....

JÊHAT

MIN SÛND XWAR ÊDÎ

Min sûnd xwar êdî

ku tuye

Kulîlka ku di dilê min de

rengê sor

Daye xwîna can

Min sûnd xwar êdî

bi kûçê

Çiyayên te ava kirine

ku tuye

Berfa spî li ser wan

Min sûnd xwar êdî

bi Ferat

Bi deşta zozan

bi Sîpan

Ku tuye Niştiman

Min sûnd xwarî êdî

bê te jîn

Dilşa û evîn

nemînin tev

Bê te KURDISTAN!

RÛNCBER/Bulgarîstan

P Ê K E N Î N

"Bavê te çawa mir"

Di wextekî de du heval hebûn. Rojekê yekî ji yê din re got:

-Brako! Îşev were mala me, emê li cem me şîv bixwin.

Yê din jî ev pejirand û pê kêfxweş bû.

Bû êvar. Yê vexwendî çû civanê xwarinê. Xwediyê malê mirîşkek di nava rûn de qelandi bû.

Êvarî çaxa hevalê xwediyê malê hat, rabûn xwarin û vexwarin anîn û li nava mezelê (odê) rêz kirin. Herdû destbirak li dora xwarinê civiyan.

Yê vexwendî çaxa çav li mirîşka qelandî ket, av bi devê wî ket û ji xwe re got: "Bi xwedê ger ez fenekê li vî hevalê xwe nekim bê fêde ye, ez têr goşt naxwim!"

Rabûn dest bi xwarina xwe kirin. Yê vexwendî ji xwediyê malê re got:

-Heval! Ma rehmetyê bavê te çawa mir ?

Hevalê wî rabû dest bi serpêhatiya bavê xwe û mirina wî kir. Yê din jî guh nade wî û hema zorê dide xwarina goştê mirîşkê. Xwediyê malê qederê seetekê dabaşa mirina bavê xwe got. Carekê çawa bû çavên wî li sêniya goştê mirîşkê dikeve. Dibîne ku, ji xeynî baskekî mirîşkê pê ve di sêniyê de ne maye.

Îcar xwediye malê bi ruwekî nexweş
ji mêvanê xwe re got:

-Heval! Ma rehmetiyê bavê te çawa
mir ?

Yê mêvan hema destê xwe avêt wî baskê
mirîşkê jî û got:

-Hema bavê min ket û mir, bila serê
me sax be.

Xwediye malê di dilê xwe de got:
"rehma xwedê ne lê be, ez di tirba
wî de bimîzim erê wele!"

BRÎNDAR

NED BÎRDEMIM

Tudbe şaxek ji rihanê şîn hatî ji bona dila
Porê dirêj çavên belek Bi rêv diçe çentel mila
Bi sed rengî li bejnê ye Dila dibî bi wan cila
Nerînek jê pir dijwar e Mirov dixê xem û kula

Eman eman sedcar eman
Ji ber yarê yara yeman
Dil şa bikî ji bona xwedan

Bi rêv diçî qet nanerî Wek ku nînim li ber çava
Pêr şa dibim ew nakenî Çiqas dikim hêvî û lava
Ned bîr demi ned dil demi Nîne ji mir gotin hava
Tim hejarim tim meraqim Ne ew bûk bî ne ez zava

Eman eman sedcar eman
Ji ber yarê yara yeman
Dil şa bikî ji bona xwedan

Çibkim ji dest vê gawirê Carek li min nazîvire
De xweş bikî jînê li min Li min bûye jîn agir e
Ken naxwazim qet jê carek Razîme jê bi awir ê
Çi gawirî gawira dil Diçî li min qet nanere

Eman eman sedcar eman
Ji ber yarê yara yeman
Dil şa bikî ji bona xwedan

DURUST/ Sûrî

ELIYÊ XEMXUR

Eliyê xemxur hebû, xema her tiştî dixwar.
Pîreka wî jê re digot:

"Elo, wisa xema mexwe. Derd û xemê dinê
pir in, tu nikarî biqedîni.

Rojekê Elo cardin diponije, darkê xwe di
erdê dida û ji pîreka xwe re got:

-Ma tu dibê xema mexwe. Kera mala cîranê me
Ehmed zaye, terya dahşka kerê bihustek
tenê ye, pir kin e. Havîni wê mêş xwe li ser
deynin, feqîra dahşikê nikare bi wê terya
kin mêşa biqewirîne.

De ka bêje! ma ezê çawa xema nexwim ?



ROVÎ Û BIZIN

Şevêkê pir tarî bû, Roviyêk ji xwe re li xwarinê digeriya. Carekê çawa bû Rovî bi xwe hisiya ku ketiye nava bîrekê avê. Rovî kir û nekir nikarî bû ji bîrê derkeve. Rovî çara derketinê nedît, wê şevê Rovî di wê bîrê de ma.

Serê sibê Bizinek hate ser lêva bîrê û dêna xwe dayê ku Roviyek di bîrê de ye.

Bizinê gote Rovî:

-Ha mamê Rovî! tu di vê bîra avê de çi dikî ?

Rovî got:

-Avek gelek xweş di vê bîrê de ye, gelek teze û şêrîn e. Ez dixwazim tu jî bê û jî vê ava teze û xweş vexwî.

Bizinê hema xwe avêt bîrê û têr av vexwar. Piştî ku têr av vexwar xwest ku jî bîrê derkeve.

Bizinê rabû gote Rovî:

-Mamê Rovî, emê çawa jî vê bîrê derkevin ?

Rovî gotê:

-Pir hêsan e. Ezê bêm ser milên te û ezê jî vir derkevim. Paşê ezê te jî jî bîrê derxînim.

Bizinê got:

-De baş e ez razî me

Rovî çû ser milên bizinê û jî bîra avê derket.

Bizinê gote Rovî:

-Mamê Rovî! de vêca min jî jî vê bîra avê

derxe,ka tê çawa min jê derxî ?

Rovî gote bizinê:

-Wele ez te ji vê bîrê dernaxim,tê di vê bîrê de bimînî.

Bizinê gotê:

-Mamê Rovî,min te ji vêderê derxist,divê tu jî min ji vir derxînî

Rovî gotê:

-Bi xatirê te! Tu têr ava şêrîn û teze vexwe!

(SALIMÊ CASIMÎ)

DEVE Û TÎTÎ

Tîtiyekî hêlîna xwe li mêrgekê çêkiri bû,
Devek jî li wê mêrgê diçêriya, piştî ku têr
dixwar, dihat li ber hêlîna tîtî mexel dihat.

Tîtî got:

-Kuro deve, lawo ma cîh tune ye ne ku tu bê
li vir mexel bê ? terpolên lingên te tiwê
pêl çêlikên min kî, biner, tiwê bela xwe bibîni
ha!

Rojek, didu, sisê, her roj bi vî karî meşiya.

Rojekê devê got:

-Kuro Tîtî, tu tevde gepik î, ez ev zir deva han
tu ji min re dibê "tiwê bela xwe bibîni!" hiii
te îcar tu bê minet î,

û pêl çêlikên tîtî kir, hemû kuştin.

Tîtî ku hevqas ji çêlikên xwe hez dikir, pir
aciz bû û ket nava xem û mitalan. Tîtî pir
ponijî. Paşê hate bîra wî ku, li çiyayê hember
wî du teyrên baz hene. Tîtî got: "bi xwedê
ez ê biçim ba wan, dibe ku bi hewara min ve
bên!" Tîtî firek da xwe û li cem bazan danî.

Silav li wan kir û derdê xwe ji wan re
got.

Teyrên baz gotin:

-Ê, tîtî, ma em ê çi bikin ku karibin tola te
hilînin ?

Tîtî got:

-Hêsan e, gava ku deve mexel hat hûn xwe dadi-nê û her yek ji we çavekî wî derxin, wê çaxê hûn tola min jê hiltînin.

Bazan got:

-Baş e,

Rabûn firek dan xwe û di ser mêrgê re çûn û hatin. Devê jî di binya wan re diçêrt. Gava ku, devê têr xwar û mexel hat, hema herdû teyran weke du tîran ku ji kevanan bifilitin xwe berdan ser devê û her yekî çavekî wî derxist. Deve ji herdû çavan kor ma. Rojek, didu sisê deh... deve pir tî bû, lê wê çawa bike? deve ber xwe nabîne. Tîtî rabû çû cem mîrê beqan û jê re got:

-Tu dikarî du beqên weha lewlewok bi emanetî bidî min ?

Mîrê beqan got:

-Belê, ji xwe re bibe

Tîtî du beqên jêhatî dan dû xwe û birin serê zinarekî bilind

Beqan pirsîn:


-Ka karê me çiye ?

Tîtî got:

-Hûn ê li vir bikin -qur-qur, karê we ev e

Beqan dest pê kir û kirin-qur-qur, Deng
çû devê û kêfa wî pir hat ewî got: "aha., ji
sedî sed li wir av heye" û xwe li dengê be-
qan girt. Beqan kir qur-qur û deve çû, Beqan
kir qur-qur û deve çû çû çû û ji nişkê ve ji
zinar werbû, Perçê mezin bûn guhên wî

Bi vî awayî Tîtî tola xwe ji devê hilanî
û her sal bê tirs hêlîna xwe li mêrgê çêkir.



JI BÎRA MIN NAÇE

Ji bîra min naçe rojen li Kurdistan
Gelek xweş bûn hem havîn hem zivistan
Dengên kewan û çivîkan dixemilandin şeveqan
Herçî wan rojan ji bîr nakim heya saxbim li
cîhan

Xerîbî nayê kişandin gelek zehmet û zor e
Brîna xerîbiyê çawa zanî pir kûr e
Mirov qedrê welatê xwe nizane heya meriv
jê nebe dûr e
Rojeke welat nayê pîvandin bi ziv û zêr e

Ez nizanim çibkim êdî li welatê xerîbiyê
Êdî çivîk min şiyar nakin weke dewranên berê
Xwezî li welat bibama dîsa li cem zerî ye
Û bi te re rûniştama li bin siya dara te ye

KURDO

DELALIYA DELALAN

Stêra bi serpêhatiya min, delaliya delalan!
Tu bihara dilê min î
Bextiyarî û xweşiya min ji te ye;
Ji te ye si-ûd û serbilindiya min
Şîrîniya ramûsan, destpaşil û dilxweşiya min
Ji bo te ye!
Tên bîra te ew rojên bextiyariyê,
Ronkahiya mala me û xweşî û hênkaya
Ber êvarê ?
Stêra bi serhatiya min, delaliya delalan

X X
X

Ber êvarî, wextê tîrêjên ro-avayî
sor û zer dibûn!
Mîna şewq û pêtiya tifikên dîwanxanan:
Me xwe avêtibû ber siya şehneşîn ê
Û xavikeke sorezer
Xwe ber rûyê dinyayê dabû
Di wê demê de te xema dilê min direvand
Û dilê te ê xurt û nerm
Çiqas nêzikî min dibû, ez dihewandim
Me ji dilketina xwe re distrand,
û dinehwirand



Ber êvarê wadê tîrêjên ro-avayî dibin sor û ze
 Di êvarên germ de roj çiqas delal e;
 Dinya fireh û pehin dibe...
 Dil xurt û bi rewa dibe
 Min xwe bi ser te de xwar dikir delaliya delala
 Ê min bêhna ciwanî û rindbûna te bêhn dikir
 Di êvarên germ de roj çiqas delal e
 Şev tarî dibû û li ber me dibû beden,
 û di reşika şevê de min reşahiya çavênte didît
 Min bêhna keçîni û çelengiya te bêhn dikir
 Nav kefên destên min bûbûn dergûşa piyên te
 Şev tarî dibû û li ber me dibû beden

X X X


X

Wan dem û rojên bihurî ez tînim bîra xwe
 Demên ku min serê xwe da bû ser çoga te
 û bi nerîna çavên te
 dinya li min dibû bihar,
 hêşîn dibûn gul û dar
 Tuyî şahî û şabûnî,
 tuyî xemrevîn û dilxweşî;
 wan dem û rojên bihurî ez tînim bîra xwe

Me li ser dilketina xwe sûnd dixwar
 Em sûnd-dayê hev bûn

Gelo ew dilketina me a borî
 vedigere ciwaniya xwe a berê
 mîna roja ku diçe ber ava! ,...

P Ê Z A N Î N (1)



Eyšê û Nûrî hezkiriyên hev in, hej hev dikin. Rojekê Eyşê dibêje Nûrî:

"Ka em bizewicin"

Nûrî dibê:

"Na! Gerek ez berê leşgeriya xwe bikim"

Nûrî diçe leşgeriyê. Eyşê çû cem kelekvan û jê re got: "Min bibe aliyê din"

Kelekvan Eyşê bir aliyê din û pênc sed benqinot jê stand.

Eyšê çû cem Ehmed û jê re got: "Ka were em bizewicin!"

Ehmed jî berê çûbû Eyşê xwestibû lê Eyşê bi Ehmed qail ne bûbû. Ehmed jî got:

"Na"

Eyšê gote kelekvan "Ka min cardin bibe aliyê din!"

Kelekvan cardin ew vegerand, lê vê carê hezar benqinot ji Eyşê stand. Eyşê jê pirsî: "Çima te vê carê hezar benqinot ji min stand?" Kelekvan got: "wê gavê roj bû, niha şev e"

Îcar! kîjan ji wan xwedî maf e û kîjan rast hiziriye (fikiriye)

Wan bi rêz bikin

- 1)
- 2)
- 3)
- 4)

Li gundekî Paşak hebû, Qîzek paşê jî hebû, Gelek diçûn qîza paşê dixwestin lê nikarî bûn serfiraz bibûna,

Çiyayekî pir bilind jî gund qedere hezar mêtro dûr bû, Paşê li serê wî çiyayî birek dabû çêkirin.

Rojekê Paşa ferman kir û merivên gund tev kom kirin û got:


"Heçî vê ava hewdik (li gund hewdikek tijî av hebû) bi seradê bibe bîra çiyê, ezê qîza xwe bidimê, Lê heçê soz da û pêk nanî ezê serê wî jêkim. Qewl jî jî serê payizê heta Avdarê ye"

Di gund de xerat ek (hoste Necar) hebû. Wî got: "Ezê vî karî bikim".

Di naybera wî qewlê ku, Paşa dabû, xerat ava hewdik bi seradê bir bîra serê çiyê.

Gelo Xerat çawa û bi çi awayî ava hewdik bi seradê bir bîra serê çiyê ?

X A Ç E P I R S



ÇEPERAST:

- 1-Navê jin an keçekê
- 2- Agir e(berepaş)
- 3-ecele, zû
- 4-Serketinek bi şahî
- 6-Hê, hêjî
- 7-Agir..Gêrik, Gêrgêrik
- 8-Navê keçekê


SEREJÊR:

- 1-Navê jin an keçekê
- 2-Roja ku em tê de
- 3-Navê mêr an kurekî
- 4-Tiştê xweşik, tiştê ku nehatiye bi kar anîn
Noteyek.


- 5-Fêkiyek ku li Kurdistanê pir e..Tiştê
ku nehatiye xebitandin (berepaş)
- 6-Fermanek ji çûnê (berepaş)...Xêza ku
meriv, trumpêl ê lawir tê re diçin
- 7-Raketin....Noteyek (berepaş)

Bersiva xaçepirsa hejmara 16 an


	1	2	3	4	5	6	7	8	9	10
1	D	Î	Y	A	R	B	E	K	I	R
2	Î	S	A	M		I	R		M	A
3	Y	A	R		E	M	Î	N	A	
4	A	L	D	A	X	I	S	T		N
5	R		I		O	R	E	Z		A
6	Î		L	E	Ç	E	K		A	N



Q E L Ū N



W Ê N E G U H Ê Z



G U M G U M O K




P Ê H L E W A N



T Î R Ő K E V A N



T Î P N I V Î S



K E Ş T Î



Z I K M E Z I N



S I M B Ê L B O Ŧ

Bersiva pêzanînên hejmara 16 an

Bersiv:

Di sala 1923 an de Kurdistan bûye çar parçe
Di sala 1974 an de LEYLA QASIM gorî bûye.
Di sala 1639 an de Kurdistan bûye du parçe.
Di sala 1880 de şerê Şêx Ubeydullah dest
pê kiriye.

Bersiv:

-Yê ku xwe padîşahê Kurdistanê diyar kiriye
ŞÊX MAHMÛD Ê BERZENCÎ ye

Bersiv:

-Di dîrokê de navê qehremanekî Kurd RISTEMÊ
ZAL e.

Bersiv:

-Xwediyê kovara "Hewar ê" CELADET ALÎ BEDIR-
XAN e.

Bersiv:

-Navê çêlikên kewan "ÇÊLKEW" in

Bersiv:

-Tiştê ku meriv dicû "BENÎŞT" e

Bersiv:

-9.8 û 1:9. 7 û 2:9. 6 û 3:9.5 û 4:9
Li ser hev dîkin(99999)

Bersiv:

-Xelasiya merivê ku, di cihê asê de ye
"Qeze" ye. Çaxa biçe wê qeze bê pêşiya wî
Ano, bajarê piçûk.

TÊDAYÎ

- 1-Zarok fêkiyên malan e
- 2-Rasto û Xwaro.....Jêhat
- 3-Min sûnd xwar êdî...,Rêncber
- 4-Pêkenîn.....Brîndar
- 5-Ned bîrdemim.....Durust
- 6-Eliyê xemxur
- 7-Rovî û Bizin.....,Salimê Casimî
- 8-Deve û Tîtî
- 9-Ji bîra min naçe.....Kurdo
- 10-Delaliya delalan
- 11-Pêzanîn-1
- 12-Pêzanîn-2
- 13-Xaçepirs
- 14-Bersiva xaçerêza hejmara 16 an
- 15-Bersivên pêzanînên hejmara 16 an

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPÅNGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 10:- skr
BIHA